



## Paşxan

Ji hebûna xwe vir de NAVEND li kargeha xwe bi xawênî karê şewira civakî û hevalbendiyê, bi giranî ji bo mişextên kurd berpêş dike.

Rewşa rojanî ya mişextên bêjimar ên ku vê dawiyê ji Sûriyê û Irakê serê xwe bar kirine (ku hejmarekê mezin ji wan kurd in) pêdiviyeye mezin bi berpêşanên agahdan, beralîkirin û amojiyê derxistiye holê.

Di ber karên xwe yê amojî û piştgiriya de NAVEND bi saya zanînen pihêt ên bingehîn ji xwe re kiriye peywir, ku bal kişandin û hişyariyê li ser mijara kurd pêk bîne û piştgiriya çanda fêmarî û hevnasiyê di navbera kurd û almanan de bike.



## Armancên Projeyê

Bi taybetî Îraq û Sûrî ciyên herî girîng in, ku niha mişext û penaber bi perspektîveke baş e mayîne ji wê derê tên. Ji van kesan beşeke mezin (hema ji sisiyan yek) xwemaliyên gelê kurd in.

Projeya „BIOS - Begegnung, Information, Orientierung, Synergie Willkommenskultur für Neuzuwanderer“, angoyên „BIOS – Pevgihîn, Agahî, Beralîkirin, Hevhêzî Çanda Bixêrhatinê ji bo yê Nûbarkirî“ ji xwe re dike armanc, ku ji bo van kesên kû vê dawiyê serê xwe bar kirine û hatine, pêdiviyên wek peywira amojî angoyên şewir, serwestkirin û eleqedariyê pêşve bixe.



## Naveroka Projeyê:

Projeya “BIOS” ji sê stûnan pêk tê:



## Peydakirina Cihên Pevgihînê yê Civakî-çandî

Li vir mebest ew e, ku berpêşanên aşkere bî çêkirin ji bo amojî, agahî, girêdanka pêwendiyên û beralîkirinê. Penaber, saziyên alman, arîkarên penaberan û mişextên kurd ên ku ji berê ve li vir in divê bigihîjin hev, danûstandinê pêk bînin, tevî hev çalakiyan çêbikin û xwe pêşve bixin.

Kesên nûbarkirî, angoyên penaberên nûhatî divê xwediyê wan derfetan bin, ku arîkariyên ji hev cihê di warên cûr bi cûr de, bi dest bixin. Bi taybet divê navbijanî bê kirin ji bo şarezayiya rojane û nixên civakeke azad, aşkere û rêzgir.



## Workshop, Perwerde û Lihevciwîn

Li bajarên NRWê yê hilbijartî divê Workshop, civîn u çalakiyên gotûbêjî yê hêsan bî lidarxistin. Ev dabeşkirin xwe bi sê awayên ku xwedî armanc û kesên pêwend ên ji hev cihê ne dide nîşandan.



## Modula 1ê: Rêza Workshopan „Bixêrhatin – Beralîkirin û Agahî“

Her wiha pêşiyê li herêma Köln/Bonnê lidarxistina Workshopên rêze yê hêsan hatin ramîn, ku aşkera baldariya her kesan bixêrhatinê û armancên xwe şewira pêşîn û agahiyên serwestkirinê parvekirin bin. Çalakiyên du an jî çar katjimêrî de xwe bidin mijarên bidûv û bi rêzik wekî pêdiviyên beralîkirin û amojî pêşîn û her wekî pêkhatin û derawayên hewcedariyê yê herêmî.



## Modula 2yan: Workshop ji bo rêberên întegrasyonê angoyên banînê

Armanca van şeş perwerdeyên navherêmî yê ji bo întegrasyonê ew e, ku ji bo beşdaran peydakirina zanînen bîgavî û yê ji bo karûbarên wek rêberên întegrasyonê digirin ser xwe. Her civînen çar katjimêrî ji van mijaran pêk tên:

- Paşxana mişextê, çandzîzî, dîn û dibe ku xwevedana dîroka xwe ya mişextiyê.
- Sihêtiya ragihanê û sîmulasyonên axivîne, stratejiyên pirsgerêk û çareserkirinê di girêdanka navçandî de û karên agahî û navbijaniyên ku lê tê gerîn.
- Ramanên bervêderan û berpêşanên di karê întegrasyonê mişextiyê de



## Modula 3yan: Hevdîtinên pevgihîştî û gotûbêjî

Rêza peyvînen domdar ên ji bo pevgihîştina û piştgirîkirina karên xawênî, rêberên întegrasyonê û nûnerên sazî û dezgehên ku di warê întegrasyonê de kar dikin. Kirar divê xwedî derfetên danûstandina tecrubeyan û gihîştina agahiyên girîng û yê di der barê mijarên diyar de bin.



## Rênîşank ji bo penaber û mişextan

Zanînen ku ji tecrubeyên cihên pevgihînan hatine bidestxistin divê di bin vê pirsê de: “Gelo ez dikarim serî li kê bixim gava ku...?” bi awayê pîrzimanî û online, wek rênîşankeke tim amade, bî kom kirin. Hemû zanînen ku ji bo





herêm û navherêman li ser mijarên wek penaber, penah û mîşextê girîng in divê bi awayekî zelal bîn kurtebirrînin.



## Damezrandina navnîşanekê navendî ji bo amojîyê

Divê navnîşaneke navendî ye serherêmî bê damezrandin, da ku agahî û lêkolînên ku bi taybet di der barê penaberên kurd de

ne, li hev girê bide û ji bo kesên pêwendîdar ên wek şaredarî, xawênî, girêdayî û karîgeran bihewînin. Ev navnîşan divê derfetekî wiha bide, ku pirsên binavkirî bi awayê telefon, e-mail an jî hevpeyvînê bîn bersivdan û agahiyên pêwîst bîn vekolîn û amadekirin. Ji bo vî cihê şewirê Bonn hat ramîn.



## Piştgirê vê projeyê:



Bundesministerium  
des Innern



## Bervêder:

Christian Bender

E-Mail: [Christian.Bender@navend.de](mailto:Christian.Bender@navend.de)

Sahin Kürküt

E-Mail: [Sahin.Kurkut@navend.de](mailto:Sahin.Kurkut@navend.de)

NAVEND – Zentrum für Kurdische Studien e.V.

NAVEND – Navend ji bo Lêkolînên Kurdî

Bornheimer Str. 20-22

Tel.: (0228) 65 29 00

Fax: (0228) 65 29 09

E-Mail: [info@navend.de](mailto:info@navend.de)

Web: [www.navend.de](http://www.navend.de)



## BIOS



*Pevgihîn Begegnung*

*Agahî Information*

*Beralîkirin Orientierung*

*HevhêzîIn Synergie*

